

Rûberga Min

guherto 1.0.1

BICIHKIRINA NIVÎSAN

Amadekar: Rêzan Tovjîn & Mahabad Arda
Weşanger: Amîda Kurd

Naverokên Rûberga Min

Lîsteya Naverokan

Ji bo lêgerînê îkona pertavê bitîkîne.

Listeya Naverokan					
+ Lê Zêde Bike + Biguhere + Nû Bike + Yê Weşandî - Yê Neweşandî + Hemû Nivîsên Min					
ID	Sernivîs	Beş	Rewş	Dema Weşanê	
141	Mirin -III-	Helbest	Neweşandî	2010-12-28	
139	Mirin -II-	Helbest	Weşandî	2010-12-27	
135	Îzm	Nirxandin	Neweşandî	2010-12-24	
126	Êşa Dayikek Ermenî	Gotar	Weşandî	2010-08-07	
125	Xwedênasiya Qehpîkekê	Gotar	Weşandî	2009-05-25	
124	Qunceq ji Mehzena Tarî	Gotar	Weşandî	2009-05-22	
123	Zeviya nivîsê	Gotar	Weşandî	2009-05-14	
122	Armanca xwedê çi ye?	Gotar	Weşandî	2009-02-20	
121	Diyalogên Hz. Nûh	Çîrok	Weşandî	2008-11-21	
120	Diyalogên Ber Diwaran	Çîrok	Weşandî	2008-11-09	

10 ⬅ ➡ Rûpel 1 Hejmara Rûpelan 3 ⬅ ➡ Ji nav 28 naverokan ji 1'ê heta 10'an hate rêzkirin.

Naverokên Rûbergê

Rûberg navekî taybet e, Rû û Berga endam e. Di vir de armanc ew e endam bi awayê herî pêşketî nivîsên xwe biweşîne, arşîva nivîsên xwe çêke û ev nivîs bi awayê herî baş di GOOGLE de bîn xuyakirin, ango di LÊGERÎN'an de derkevin pêş.

- Endam (**nivîskar**, **sazî û kes**) dikarin nivîsên xwe li gor beşan belav bikin: Gotar, Nirxandin, Helbest, Çîrok, Nivîsên Wêjeyî, Ziman û Perwerde û hin wekî din. Di dema pêş de Nirxandinên hemû nivîskaran dê di yek kategoriye de bîn cem hev, hemû helbestên hemû nivîskaran jî dê di yek kategoriye de bîn cem hev. Bi vî rengî xwendevan jî dê rûpel bi rûpel li helbestên kesan neyerin, lê di rûpela Helbest a **Serûpelê** de hemû helbestan bi carekê re bibîne. Beşên din jî her wisa.
- Endam ne mecbûr in hemû nivîsên xwe biweşînin û bi her kesî re parve bikin. Ji bo wê jî dema nivîsên xwe weşandin, dikarin vebijêrka **Biweşîne** nîşan nekin.
- Di pêşerojê de dê arşîva her endamekî dewlemend bibe, wê demê zehmet e mirov li gotarek xwe bigere. Ji ber wê li jêra lîsteyê wêneyê pertavê ji bo lêgerînê hatiye bicihkirin. Dema endam pertavê bitîkîne, dikare gotinekê binivîse û lo gor sernavê gotaran lê bigere. Li gor sernav, dîroka weşanê, beş û hin wekî din jî **lêgerîn** mimkûn e.
- Li jêra lîsteyê xuya dike ku niha 10 naverok hatine rêzkirin, lê kes bixwazin dikarin heta 40 naverokan jî rêz bikin, ji bo çavlêgerandinê.
- Sernivîs**, **beşa nivîsê**, **weşandî**, **neweşandî** û **dîroka weşanê** û hin wekî din di rêzikan de xuya dikin, ji bo endam arşîva xwe bi hêsanî bi rê ve bibin.

Lê Zêde Bike



Di wêneyê jorîn de bişkojja **Lê Zêde Bike** xuya dike. Ji bo mirov gotarek nû di beşan (kategoriyan) de bi cih bike, divê ev bişkojk carekê were tikandin. Piştî tikandinê dê ev zeviya (form) jêrîn vebe.

Zeviya Lêzêdekirina Qunciknivîsan

Sernivîs :	Rojbaş Amed
Beş :	-Helbest
Biweşîne :	<input checked="" type="checkbox"/>
Dema Weşanê :	2011-01-4 20:52
Sef Url :	rojbaş_amed
Title :	Rojbaş Amed
Danasîn :	Rojbaş Amed
Gotinên Miftehî :	rojbaş,amed

Tomak Bike

Em Zeviya Nivîsê Nas Bikin

Zeviya Nivîsê bi awayekî pêşbînî hatiye amadekirin. Di destpêkê de pir tişt xuya dikin, lê ya rast mirov têkildarî her tiştê vê zeviyê (form) nabe.

Sernivîs: Li vir endam sernivîsa gotara xwe bi cih dike, mînak: “Rojbaş Amed”.

Beş: Li vir jî mirov beşa naverokê hildibijêre, ji bo di kategoriya rast de cih bigire.

Biweşîne: Heke nivîs ji weşanê re amade be endam dikare dest vir nede, heke bixwaze piştî dîsa vê nivîsê biguhere û dû re biweşîne, nexwe dikare vebijêrka ber wê rake.

Dema Weşanê: Dibe ku nivîs kevin be û endam dixwaze li gor dîroka nivîsandina wê bi cih bike, wê demê li vir dikare Sal, Meh û Roja weşanê hilbijêre.

Nîşe: Nivîs di Rûberga endaman de li gor vê dîrokê tên rêzkirin.


Sef URL: Ev zevî bixweber tê tijîkirin, endam destê nedinê çêtir e.

Title: Ev zevî bixweber tê tijîkirin, endam destê nedinê çêtir e.

Danasîn: Endam herî pir dikarin bi 8 bêjeyan vê nivîsê bidin naskirin, lê ji bo ihtîmala ku dê nexwazin binivîsin, me ev beş bixweber daye tijîkirin.

Gotinên Miftehî: Mînak di GOOGLE de dema li gotina “rojbaş” û “amed” bê lêgerîn, ev naverok dê ji aliyê GOOGLE ve were pêşniyazkirin. Yanî ev zevî rasterast ji GOOGLE re dibêje, “li gor van gotinan nivîsek wiha li cem min heye.”

Ev zevî jî bixweber li gor sernivîsê tijî dibe, bêhnok dikeve navbera gotinan û ev pîvanek nivîsbarî (information) ye. Heke endam bixwaze dikare gotinên miftehî ji nav nivîsa xwe hilbijêre û dîsa bêhnokê têxe navbera wan û bi vî rengî di vê beşê de lê zêde bike, lê heke te fam nekiribe bê ev beş bi kêrî çî tê û pîvana wê çî ye, destê medê.



Di zeviyê de wekî wêneyê niha li çepê xuya dike, bişkojkên **Destpêk** û **Dûmahîk** hene.

Ev herdu tişt girîng in.

Wekî tê zanîn, di malperê de Destpêka nivîsê xuya dike û heta mirov nivîsê netikîne, Dûmahîk yanî hemû nivîs xuya nake.

Ji ber vê yekê, berî ku em Tomar Bike bitikînin û nivîsê bi cih bikin, divê em bi qasî 2-3 hevokan di beşa Destpêkê de bi cih bikin û hemû nivîsa mayî jî di Dûmahîkê de bi cih bikin.

Berî tu Tomar Bike bitikîni, beşa destpêkê ya nivîsa xwe wekî di wêneyê de jî xuya dike, di Destpêkê de bi cih bike, piştî Dûmahîkê bitikîne û di li wir hemû nivîsê bi cih bike.

Piştî te dûmahîk jî bi cih kir, îcar bişkojka li jor xuya dike, **Tomar Bike**'yê bitikîne û dê nivîs tomar bibe. Heke te **Biweşîne** hilbijartibe, jixwe dê rasterast têkeve weşanê, heke te **Biweşîne** ne hilbijartibe, kengî dema ku te xwest, were beşa Qunciknivîsan û navê nivîsê bitikîne û piştê wekî li jêr di wêne de dixuye, bişkojka **Biguhere** bitikîne. Di zeviya vebûyê de, nivîsa xwe li gor



xwe biguhere, piştê vebijêrka Biweşîne bitikîne û Tomar Bike'yê bitikîne.

Heke nivîsên te pir bin û tu nikarî nivîsa neweşandî bibîbî, wekî di wêne de xuya dike, bişkojka **Yên Neweşandî** bitikîne, an jî **Pertava** li jêra lîsteyê bitikîne û li gor navê nivîsê Lê Bigere.